Hospice général

Lêveger bo: Guherînên têkildarî Rehetiya Civakî ji Çileya 2025an va

Têbînî bo kesên têkildar:

Qanûna nû ya Rehetiya Civakî, bi navê ”Qanûna Rehetiya Civakî û Têkoşîna dijî Belengaziyê” (LASLP), dê ji Çileya 2025an va bikeve cihanînê. Têkiliya te digel Hospice général’ê dê tûşî hin guherînan were û ev guherîn dê li ser xêra hemîyan be.

Armanca sereke ya vê qanûnê piştevaniya herî zêdetir ji sûdwergirên ji Refaha Civakî û hêsankirina pêvajoya entegrasyona civakî û profesyonel a van kesan e. Ev qanûn her wiha jêbirin û çareserkirna pirsgirêkên ji ber belengaziyê li Jenevê û sadekirina pêvajoya destragihîştina bo Rehetiya Civakî jî dişopîne.

Sûd û feydeyên te yên darayî dê zêdetir bibin û dê bi pereyên serhev werin kemilandin. Ev pereyên serhevdakirî îmkana birêvebirina hin fatûreyan ku pêştir te raberî Hospice général’ê dikirin, dabîn dike. Bi vî rengî, serxwebûna te di ware rêveberiya bûdceyê tê bihêzkirin.

Bi armanca piştevaniya ji te di pêvajoya vegera bo kar da, heta karê nîvdemî, qasa pereyê kêmkirina ji derhatê piştî destpêbûna pêvajoya bidestxistina derhatê tê sepandin. Loma derhata te ya mehane piştî şixulînê zêdetir dibe.

Hin guherînên din jî din qanûna nû da hatine pêşbînîkirin. **Ji bo wergirtina zanyariyên zêdetir**, em te vedixwînin da ku:

- Vîdyo û belgeyên fêrkariyê bi rêya lînka xwarê bibînî û bixwînî: **laslp.hospicegeneral.ch**
- Beriya bidawîhatina sale, digel karmendên Hospice général’ê hevdîtin pêk bîne û rewşa xwe ya taybet digel wan parve bike

Bi rêzdarî,

Rêveberiya Hospice général’ê